

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Mehmet ŞENTÜRK**

**MOLLA ABDURRAHMAN VELEDİ'NİN HAYATI, SANATI VE**  
**MEVLİDA FAHR-I ALEM MUHAMMED (SA) ESERİNİN**  
**İNCELENMESİ VE DİĞER KÜRTÇE MEVLİDLER ARASINDAKİ**  
**YERİNİN İNCELENMESİ**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2021**



**K.T.**  
**ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN**  
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Mehmet ŞENTÛRK**

**JIYAN Û HUNERA MOLLA ABDURRAHMAN WELEDÎ Û LÊKOLÎNA**  
**BERHAMA MEVLÛDA FAXRI ‘ALEMÊ MUHAMMED (SA) Û**  
**MUKAYESYA VÎ MEWLÛDÎ DIN NAVA MEVLÛDÊ KURDÎ DE ÇI YE**

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**  
**Dr. Öğr. Üyesi Turan GÜLER**

**MÛŞ-2021**

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Mehmet ŞENTÜRK**

**MOLLA ABDURRAHMAN VELEDİ'NİN HAYATI, SANATI VE**  
**MEVLİDA FAHR-I ALEM MUHAMMED (SA) ESERİNİN**  
**İNCELENMESİ VE DİĞER KÜRTÇE MEVLİDLER ARASINDAKİ**  
**YERİNİN İNCELENMESİ**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**  
**Dr. Öğr. Üyesi Turan GÜLER**

**MUŞ-2021**

## NAVEROK

NAVEROK .....	I
ÖZET .....	IV
KURTE .....	V
ABSTRACT.....	VI
PÊŞGOTIN.....	VII
KURTEBÊJE .....	VIII
DESTPÊK.....	1

## BEŞA YEKEM

### JIYAN Û BERHEMÊN SEYÎD MOLLA ABDURRAHMAN VELEDÎ HEMZE

1.1. JIYANA WÎ.....	4
1.2. BERHEMÊN SEYÎD MOLLA ABDURRAHMAN VELEDÎ HEMZE .....	6
1.2.1. Berhemên ‘Erebî .....	6
1.2.2. Berhemên Kurdî.....	8
1.2.3. Berhemên Tirkî .....	8

## BEŞA DUYEM

### MEWLÛDÊN KU BI KURDÎ HATIYE NIVÎSANDIN Û DI NAVA MEWLÛDÊN KURDÎ DE CÎ YÊ MEWLÛDA FAXRÊ ‘ALEMÊ ÇI YE

2.1. MEWLÛDÊN KU BI KURDÎ HATIYE NIVÎSANDIN.....	11
2.1.1. Mela Huseynê Bateyî: Mewlûda Nebî .....	15
2.1.2. Şêx Muhammed Emîn el-Heyderî: Mewlûda Nebî.....	16
2.1.3. Şêx Muhammed Siracuddîn: Durra Birincî Mewlûda Kurmancî.....	18
2.1.4. Mela Muhammed Xursî: Nazma Şîrîn .....	18
2.1.5. Mela Zahîd: Mewlûda Şerîf Herdû Bâtî.....	19
2.1.6. Mela Suleyman Kurşun: Mewlûda Pêxember.....	20
2.1.7. Molla Salih Huseyn: Mewlûda Kurdî Bi Zimanê Gundî .....	21
2.1.8. Mela Elî bin es-Seyid ‘Evdîrrehman Omerî: Ava Heyat .....	21
2.1.9. Mela Muhammed ‘Elî Fudeylî: Mewlûda Şerîf .....	22
2.2. DI NAVA MEWLÛDÊN KURDÎ DE CÎ YÊ MEWLÛDA FAXRÊ ‘ALEMÊ ÇI YE .....	23

## BEŞA SÊYEM

### LÊKOLÎNA METNA MEWLÛDA FAXRÊ ‘ALEMÊ

3.1. NAVÊ MEWLÛDÊ.....	25
------------------------	----

<b>3.2. NAVÊ NIVÎSKARÊ BERHEMÊ</b> .....	25
<b>3.3. TARIXA NIVÎSA MEWLÛDÊ</b> .....	25
<b>3.4. HÊJMARA COTBENDAN</b> .....	25
<b>3.5. SEDEMÊ NIVÎSA WÎ MEWLÛDÎ</b> .....	25
<b>3.6. KÊŞA MEWLÛDÊ</b> .....	33
<b>3.7. QAFIYAYÊN MEWLÛDÊ</b> .....	33
3.7.1. Qafiyeya Nîv .....	34
3.7.2. Qafiyeya Tam .....	34
3.7.3. Qafiyeya Dewlement .....	35
3.7.4. Qafiyeya Tunç .....	35
<b>3.8. REDÎFÊN MEWLÛDÊ</b> .....	36
<b>3.9. HUNERÊN EDEBÎ</b> .....	36
3.9.1. Teşbîh .....	36
3.9.2. Mecazî Mursel .....	37
3.9.3. Tezat .....	37
3.9.4. Alîterasyon .....	39
3.9.5. Asonans .....	39
3.9.6. İktîbas .....	40
3.9.7. Telmîh .....	41
3.9.8. Mubalaxa .....	42
3.9.9. Tenasup .....	42
3.9.10. Tekrîr .....	43
<b>3.10. NAVEROKA BEŞÊN BERHEMÊ</b> .....	43
3.10.1. Beşa yekem .....	43
3.10.2. Beşa Duyem .....	44
3.10.3. Beşa Sêyem .....	44
3.10.4. Beşa Çaran .....	44
3.10.5. Beşa Bencan .....	44
3.10.6. Beşa Şeşan .....	44
3.10.7. Beşa Heftan .....	45
3.10.8. Beşa Heştan .....	45
3.10.9. Beşa Nehan .....	45
3.10.10. Beşa Dehan .....	45
3.10.11. Beşa Yanzdan .....	45

3.10.12. Beşa Donzdan.....	45
3.10.13. Beşa Sêzdan.....	46
3.10.14. Beşa Çardan.....	46
3.10.15. Beşa Banzdan .....	46
3.10.16. Beşa Şanzdan.....	46
3.10.17. Beşa Hevdan.....	46
3.10.18. Beşa Hejdan.....	46
3.10.19. Beşa Nozdan.....	46
3.10.20. Beşa Bîstan .....	47

### **BEŞA ÇARAN**

#### **MEWLÛDA FAXRÊ ‘ALEMÊ MUHAMMED (S.A.)**

<b>4.1. FATIHA MEWLÛDA MUHEMMED MUSTEFA .....</b>	<b>48</b>
<b>4.2. HEYAT Û RÎSALETA MUHEMMED MUSTAFA.....</b>	<b>49</b>
<b>4.3. NASKIRIN Û MUHEBBETA MUHEMMED MUSTEFA WACIB E.....</b>	<b>49</b>
<b>4.4. ZAROKTIYA MUHEMMED MUSTEFA .....</b>	<b>51</b>
<b>4.5. CIVANTIYA MUHEMMED MUSTAFA .....</b>	<b>52</b>
<b>4.6. HATINA NUBUWETÊ JI BO MUHEMMED MUSTAFA.....</b>	<b>53</b>
<b>4.7. HATINA RÎSALETÊ JI BO MUHEMMED MUSTAFA.....</b>	<b>54</b>
<b>4.8. MERHELA MEKKEHÊ MERHELA EZYETÊ BÛ .....</b>	<b>55</b>
<b>4.9. HÎCRETA ESHABAN BI BAL NECAŞÎ .....</b>	<b>57</b>
<b>4.10. BEHSA MÎ'RACA MUHEMMED MUSTAFA.....</b>	<b>58</b>
<b>4.11. BEHSA HÎCRETA BI BAL MEDÎNA MUNEWWER VE.....</b>	<b>59</b>
<b>4.12. BEHSA MERHELA MEDÎNA MUNEWWER.....</b>	<b>60</b>
<b>4.13. BEHSA SULHA HUDEYBIYE DIGEL FETHA MEKKÊ .....</b>	<b>61</b>
<b>4.14. BEHSA HECCA MUHEMMED MUSTAFA .....</b>	<b>63</b>
<b>4.15. WEFATA MUHEMMED MUSTEFA SELAT Û SELAM LI SER BIN.....</b>	<b>64</b>
<b>4.16. DEWAMA WEFATA MUHEMMED MUSTAFA.....</b>	<b>65</b>
<b>4.17. PAŞIYA MEWLÛDA NEBÎ SELLALLAHU ‘ELEYHÎ WE SELLIM TEV MÎSK Û ‘ENBER .....</b>	<b>66</b>
<b>4.18. EV TIŞTEK JI HEYATA XWUDYE MEWLÛDÊ.....</b>	<b>69</b>
<b>ENCAM .....</b>	<b>72</b>
<b>ÇAVKANÎ .....</b>	<b>73</b>
<b>PÊVEK -1 .....</b>	<b>76</b>
<b>PEVÊK -2 .....</b>	<b>93</b>

## ÖZET

### YÜKSEK LİSANS TEZİ

#### MOLLA ABDURRAHMAN VELEDİ'NİN HAYATI, SANATI VE MEVLİDA FAHR-I ALEM MUHAMMED (SA) ESERİNİN İNCELENMESİ VE DİĞER KÜRTÇE MEVLİDLER ARASINDAKİ YERİNİN İNCELENMESİ

Mehmet ŞENTÜRK

Danışman: Dr. Öğr. Üyesi Turan GÜLER

2021, 140 sayfa

Mevlit geleneği Arap ve Türk toplumlarında olduğu gibi Kürt kültür ve edebiyatında da oldukça önemli bir yer tutmaktadır. Peygamber (sav) sevgisi farklı edebi türlere konu olsa da halk arasında en yaygın olan tür şüphesiz mevlitlerdir. İslâmi Kürt edebiyatında mevlit yazma geleneği çok eskilere dayanmaktadır ve günümüze kadar farklı kişiler tarafından çok sayıda Kürtçe mevlit yazılmıştır. Bunlardan biri de hem demimiz olan Molla Abdurrahman'ın yazdığı Mewlûda Fahr-ı 'Alemê Muhammed (sav)'dir. "Mewluda Fahr-ı 'Alemê Muhammed (sav)" (Metin- İnceleme) adlı bu çalışmanın amacı, Kürt edebiyatında önemli bir yere sahip olan mevlit türünün bir örneği niteliğindeki bu eseri bilim dünyasına kazandırmaktır. İlk olarak mevlit türüne genel olarak değinilmiş, İslam medeniyetinde ve Kürtlerde mevlit geleneği hakkında bilgi verilmiştir ayrıca Kürt edebiyatında daha önce yazılmış bu türdeki eserler ve yazarları hakkında bilgi verilmiştir. Sonrasında üzerinde çalıştığımız mevlit şairi Molla Abdurrahman'ın hayatı, eğitimi ve yazdığı eserlerden söz edilerek mevlidin muhteva özelliklerinden bahsedilmiş ve metin merkezli inceleme yöntemiyle asıl metne geçilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Kürt Edebiyatı, Mevlit, Hz. Muhammed, Molla Abdurrahman.

## KURTE

### TEZA MASTIRÊ

# JIYAN Û HUNERA MOLLA ABDURRAHMAN WELEDÎ Û LÊKOLÎNA BERHAMA MEVLÛDA FAXRI ‘ALEMÊ MUHAMMED (SA) Û MUKAYESYA VÎ MEWLÛDÎ DIN NAVA MEVLÛDÊ KURDÎ DE ÇI YE

ŞENTÛRK, Mehmet

Danışman: Dr. Öğr. Üyesi Turan GÜLER

2021, 140 Rupel

Kevneşopîya nivîsandina mewlûdan çawan ku di nav ‘Ereb û Tirkan de bi cîh bûye di nava çand û edebiyata Kurdan de jî gelek gîrîng bûye. Hêzkirina pêyxember bi cur be curê edebîyatande hatiye neqîşkirin. Lakîn ya ku di nava gel de hatiye qebulkirin bêguman mewlûd e. Di edebîyata Kurdî de kevneşopîya nivîsandina mewlûdan pir qedîmî ye. Gelek kes mewlûd nivîsandine û yek ji wan jî nivîskar Molla Ebdurrehman e ku wî mewlûda ya bi navê “Mewlûda Faxrê ‘Alemê Muhammed (sav)” nivîsandiye. Di vê xebatê de armanca me ev e ku di edebîyata Kurdî de cîhê vê mewlûdê çiyê bê nasîn. Di beşa ewil de derheqê mewlûdan de, cîhê wê ya di ola Islamê de û di nav Kurdan de hatiye tesbît kirin û bi çarçoveya giştî agahî hatîne berpêşkirin. Piştî jî me derbarê mewlûdên ku heta îro hatîne nivîsandin di edebiyata Kurdî de agahî daye û derheqê jîyan û perwedehî û berhemên Molla Abdurrahman melûmat pêşkêş kirine. Paşê jî em li ser lêkolîn û şîroveya metna mewlûdê sekînîne.

**Peyvên Sereke:** Edebiyata Kurdî, Mewlûd, Hz. Muhammed, Molla Abdurrahman.

## **ABSTRACT**

### **MASTER'S THESIS**

#### **MOLLA ABDURRAHMAN'S LIFE, ART AND ANALYSIS OF THE "MEWLÛDA FAXRI ALEMÊ MUHAMMED (SAV)" AND INVESTIGATION OF ITS PLACE BETWEEN OTHER KURDISH MEVLITS**

**ŞENTÛRK, Mehmet**

**Advisör: Assistant Prof. Turan GÜLER**

**2021, Page: 140**

Mullah Abdurrahman's Life, Art And Examining His Work, Mewluda Faxri Alemê Muhammed, And Examining its Place Among Other Kurdish Mevlits. Mevlit tradition has a great importance in Kurdish culture and literature as in the Turkish and Arabian societies. Although love of Prophet (saw) is subject to different literary genres undoubtedly mevlits are the most common genres among people. For Islamic Kurdish literature, the tradition of writing mevlit dates back to old times and until today numerous Kurdish mevlits has been written by different people. One of them is "Mewlûda Faxri Alemê Muhammed" written by Mullah Abdurrahman. Purpose of this study which is named "Mewlûda Faxri Alemê Muhammed "(Text Analysis) is to make a contribution through this work, which has an important role in Kurdish literature, to the world of science. First of all the mevlit genre has been explained in general, information has been given about the mevlit tradition in Islam civilization and Kurds and also information has been given about previously written works and their authors in Kurdish literature. Then it has been mentioned about Mullah Abdurrahman's, author of mevlit who is we work on him, life, education and works. After that content of mevlit has been explained and passed on to original text by text-centered research method.

**Key Words:** Kurdish Literature, Mevlit, The Prophet Muhammad, Mullah Abdurrahman.

## PÊŞGOTIN

Di nava mislimanê Tirk, ‘Erep û Kurdan de hezkirina pêxemberê Xwuda pir girîng e û ev hezkirin daxwestinekî ji aliyê olî ve hatiye qebulkirin. Ev mijar di edebiyata van mislimanan de jî xuya dike. Cara peşîn mînakê mewlûdan di nav ‘Ereban de derketiye holê. Di nav edebiyata ‘Ereban de helbestên medhiyê de cîhê Pêyxember zev girîng e. Piştî wefata Hz. Muhammed ev cureyê helbestên medhiyan pir pêş ve çuye. Helbestên ku ji bona pesindayînê hatine nivîsandin di nava wan de yê herî girîng bê guman mewlûd e. Di mewlûdê de mijarên ku hatiye neqîşkrin tevahî olî ye. Çavkanîyê mewlûdan ji Qurna pîroz û ji sinneta Pêyxember hatiye berhevkirin. Jiyana Pêyxemer ji dayikbûna wî, zarokatiya wî, civantiya wî, wazîfeya teblîxê, mu’cîzeyên wî û têkilîya wî ya bi eshaban re bi rubarî hatiye neqîşkrin. Cara beşîn din av ‘Ereban de mewlûd hatiye nivîsandin, piştî di setsala carden de di nav Tirk û Kurdan de hatiye nivîsandin. Mewlûdên ku bi Tirki hatiye nivîsandin ne zêde 200 hebin, yê ku bi Kurdî hatiye nivîsandin jî nêzê 60 hepin. Helbestvanê mewlûdan pir di bin bandora hevde mane. Di edebiyata Kurdan de bandora Melayê Bateyî bi cih bûye û yê ku mewlûd nivîsandîye li ser rêça wî çûne. Hemî helbestvanê mewlûdan ji bo gelek sedeman mewlûd nivîsin e: hezkirina Pêxember ku bi wî awayî silav û hurmetê xwe peşkêş dikin, hêvîdariya şef’eta Pêxember û her çiqas bête xwendin ji ber xêr û hesenata wî gelek kes mewlûd nivîsandin e. Yê ji wan nivîskaran yek jî Seyîd Molla Abdurrahman Veledî Hemze ye. Molla Abdurrahman perwedeyîya xwe di medreseyên klasîkte temam kirîye û ji ber vî yekî bi ‘Erebî, Tirkî û Kurdî dizane û bi van zimanan gelek berhem nivîsandîye. Molla Abdurrahan berhemê wî ya ku tîpên ‘Erebî û bi Kurmancî hatiye nivîsandin me li ser vî berhemî bi her awayî lêkolîn kiriye.

Di vî xebata me de gelek kes alîkarî û bişgirek dane me û ji bo destekvaniya wan kesên re sipasiya xwe peşkeş dikim. Di vî xebata me da helbestvanê vî “ Mewlûda Faxrê ‘Alemê (sa)” Seyîd Molla Abdurrahman Veledî Hemze bi her awayî alîkarî daye me. Ji bo ku teza xwe ya bilind binime dawîyê û bi qednim ku ji her cûrê piştgiriya xwe venakêşandiye hevalên heja Ayhan TEK, Îlyas SAYIM û şewirmendê min Dr. Öğr. Üyesi Turan Güler re gelek sipas dikim.

**Mûş-2021**

**Mehmet ŞENTÜRK**

## KURTEBÊJE

MFA	:	Mewluda Faxrê Alemê
x.n	:	xebata navborî
g.n.	:	gotara navborî
a.s.	:	Aleyhi selam
a.I.d.	:	Ansîklopediya Islamê ya Diyanet
B.M.	:	Berîya Mesîh
P. M.	:	Piştî Mesîh
m	:	mîladî
rp.	:	rupel
rz	:	rez
h.r	:	hejmara rupel
CZT	:	Civaka Zimanê Tirkî
WWDT	:	Weşanên Weqfa Diyanetê ya Tirk
(SAV)	:	Sallalahü Aleyhi Vesellem
H.z.	:	Hazreti
Rxl.	:	Rehma Xwuda liser be
hwd	:	hevwekdin

## **DESTPÊK**

### **Wateya Mewlûdê û Dîroka Wî**

Bêjeya mewlûdê ji zimanê ‘Erebî tê. Ji tîpên “w, l, d” pêk tê. Wateya wê ya ferhengî, cîyê ji dayikbûnê û dîroka ji dayikbûnê ye (Pala, 1990: 339). Ev wate di nava demê de guheriye; jidayikbûna cenabê Pêxember, pîrozkirina vê rojê û merasîmên wê û herwiha mesnewî û risteyên ku di vî warî de hatine nivîsandin hemû di binê vê wateyê de hatine kom kirin. Di hemî mewlûdan de mijar bê guman jîyana Hz. Pêxember e. Ji dayikbûna Pêxemberê Xwedê dest pedike, zaroktiya wî, ciwantiya wî, zewaca wî, teblixa wî, hîcreta wî, mu’cîzeyên ku di vê pêvajoyê de derketiye holê, herbên wî, bidestxistina Mekkê, wefata wî, mijara mî’racê, û herwiha jiyana Pêxember de qonaxê herî girîng mijarên serekê yên mewlûdê ne ( Karacan ve Aykut, 2015: 3).

Di serdema Hz. Pêxember de, di dewera çar xelîfeyan, Emeviyan û ‘Abbasîyan de nivîsandina mewlûdan an jî pîrozbahiya mewlûdan tunebûye. Bi sedan salan piştî jîyan û heyama Hz. Pêxember, ji bo pîrozkirina rojbûna an ji ji dayikbûna Cenabî Pêxember pîrozbahiya mewlûdan hatine lidarxistin. Di wextê Fatimîyan de li Misrê pêkanina mewlûdan hêdî hêdî destpêkireye. Le belê hinek ‘alimê sunîyan ji bo ku bid’ete li vî mijarî baş nefikirîne. Pişt re hêzkirina Hz. Pêxember giran hatiye û li her derî belav bûye (Samsakçı, 2010: 20).

### **Kevneşopiya Mewlûdan**

Merasîma mewlûdê ya ku ji bo pîrozkirina rojbûna Hz. Muhammed tê kirin, çendî bi sedsalan piştî Hz. Pêxember derketibe jî yek ji wan ûnsûrên girîng e ku bandor li dîndariya gel dike. Merasîmên mewlûdê ji demên pêşîn ên ku derketiye heta îro di nav mislimanan de bi sedsalan dewam kiriye û li her derê ‘alema Islamê hatiye sepandin. Ew metnên ku ji bo van merasîman de bî xwendin jî, wekî merasîmên mewlûdê berbelav bûne. Di derbarê dema derketina yekemîn merasîma mewlûdê cara pêşîn di dema Fatimîyan de (910-1171) li Misrê çêbûye (Kızıl & Şingâr & Çetin, 2015: 116). Li gorî nêrinek cuda jî kesê ku rewresmên mewlûdê daye destpêkirin Mizeferuddîn Kokborî ku li Hewlêrê deshilatî kiriye. Dibe ku ji ber pîrozbahiyên komî yan jî pîrozkirina erkanê dewletê ev herdu nêrînen cuda derketibin. Çunkî pîrozbahiyên serdema Fatimîyan, li dor merasîma dewletê çêbûye ku peywirdarên payebilind beşdar bûne, tevlêbûna gel wekî komî nehatiye dîtin di van rêwresman de. Merasîmên mewlûdê yên ku gel hemî îştîraqê

wê kiriye, cara pêşîn di 1207an de li Hewlêrê, di serdema Mizeferuddîn Kokborî de li dar ketiye. Merasîma mewlûdê piştî vê serdemê di alema Islamê de wekî merasîmên mezin hatine pîrozkirin (Kızıl & Şingâr & Çetin, 2015: 118). Zavayê Selaheddînê Eyyûbî, Muzaferuddîn Gokboro (m. 1232), merasîmên mewlûdê li Îran, Anatoliya û Sûriyeyê belav kiriye. Ji ber ku li deverekî fireh ev merasîm bi destê Muzaferuddîn Gokboro hatine belav kirin û weke şênahiyên herêmî hatiye pîrozkirin. Ev zat, di vê mijarê de weke mirovê pêşîn tê naskirin (Ertekin, 2015: 103). Pirazbahiyên mewlûdên ku li Misrê û li Hewlêrê hatiye lidarxistin bi muzîq û kêf, seyranan û şênahiyên de derbas bûye. Piştê ev çalaki li Mekkê û li Medîne jî hatiye li darxistin û piştê guheriyê û li her derî belav bûye (Alyılmaz, 1999: 196). Dema Osmanîyan de bi awayekî fermî wexta Mûradê sêyemîn, pîrozbahiyên mewlûdê 1588da pêk hatiye (Şener ve Yıldız, 2011: 171). Ev xwendin, pîrozbahî û belav bûna mewlûdan ji alîgiri hinek ‘aliman ve nehatiye pejirandin li belê niha jî li her dera ola Islamê de tê bikaranîn.

Ji bilî ‘Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdî, Arnavudî, Boşnakî, Rumî, Çerkezî, bi zimanê Cava, Urdî, Savahîlî, Alhamyado (Bi tîpên ‘Erebî tê bikaranîn û zaravayek ji zimani Îspanyolî ye) û Tatarî hatiye nivîsandin (Gürlek, 2013: 2).

Di serdema wextê me de bi taybetî li Suudîya ‘Erebîstanê û çend dewletan de ji ber ku bid‘et e nehatiye pejirandin û bi tundî hatiye qedexekirin.

Di nav gelê Kurd de, kevneşopiya nivîsîn û xwendina mewlûdê li gorî netewiyê din gelek zindî ye. Di perwerdayiya medreseyan de zarok ku xwendin û hînkirina Qurana pîroz xelas bû pişt re mewlûdê hîndibin piştî mewlûdê dest bi Nûbihara Buçukan (Ahmedê Xanê) diken (Yüksel, 2015: 130). Bi tevahî axa û begê Kurdan bi berfirehî pîrozbahiya mewlûdan pêk anîne. Şêx û melan çûne kîjan gund û welatî li ser xêr û heseneta mewlûdan sekinîne. Li herema Kurdan de zivistan jiyanê dîl digire û şevî dirêj de ji bo civak mewlûd çalakîyekî mezin hatiye qebulkirin. Ji ber van sedeman pîrozbahiya mewlûdan bûne çalakîyen civakî. Çanda mewlûdê di nav civaka kurdan de ewqas zindîye ku kengî zarokek çêbibe, kengî kurek bê sinetkîrin, ku yek ji leşkeriyê hat, roja dawetekî, yek ji hecê hat, yekî serkeftinek bi dest xist, ji pêkanîna tiştêkî girîng, kengî kesek bimire di te‘ziya wî kesî de, çaxê xêrekî, di ber bela û musîbetekî de mewlûd tê xwendin û paşê jî xwarin tê xwarin (Ertekin, 2015:104).

### **Armanca Vî Xebatî**

Armanca me ya li ser vî xebatî eve ku nivîskar û helbestvan Seyîd Molla Abdurrahman Veleđî Hemze: jiyana wî, berhemên wî yê din çine û berhema ku bi navê “Mewlûda Faxrê ‘Alemê” nivîsandiye metnê wî rexne û lêkolîn bikin. Armanca me ya din ji eve berhema ku bi tîpên ‘Erebî bi kurmanci hatiye nivîsand Latînzaya Kurdî bikin û vergera Tirkî bikin.

### **Girîngiya Vî Xebatî**

Seyîd Molla Abdurrahmna Veleđî Hemze kîye û berhemên ku nivîsandiye ji aliyê gelek kesan ve bête nasîn û xwendin. Latînzaya vî û vergera berhema “Mewlûda Faxrê ‘Alemê” ji aliyê gelek kesan ve bête xwendin û nasîn. Girîngiya vî xebatî yek jî eve ku di beşa edebiyata Kurdî ya klasîk de bibe çavkanîyekî.

### **Çarçoveya Vî Xebatî**

Di vî xebatî de jiyana û berhemên Seyîd Molla Abdurrahman Veleđî Hemze û berhema wî ya “Mewlûda Faxrê ‘Alemê” hatiye lêkolîn û tehlîl kirin. Di edebiyata Kurdî ya klasîkte ciyê vî mewludî hatiye tespîtkirin.

### **Çavkanyên Vî Xebatî**

Di vî xebatî de çavkanîyên ya herî girîng nivîskarê vî mewludê Seyîd Molla Abdurrahman Veleđî Hemze ye. Ew ji meletîyê teqawût bûye li navenda Batmanê jiyane xwe didomîne. Der heqê vî teza mastirî de ji me re her agahî û çavkanîyan parve kirîye. Car caran bi telefonan car caran jî rû bi rû em li ser vî mijarî axifîne û seyda li her pirsê me re bersîvek daye û temamî agahî û çavkanîyên xwe bi me re parve kirîye. Ji bili vî mewludî, mewludên ku bi kurmanci hatiye nivîsandin bi kurtasî hatiye lêkolînkirin. Tevahîyê mewludan çavkanîya wana a bingehî Qur-ana pîroz û sinnata Hz. Pêxemer e. Ji xeynê van, pirtukên ku li ser mewludan hatiye nivîsandin me serî li wan ji xistîye.

## BEŞA YEKEM

### JIYAN Û BERHEMÊN SEYÎD MOLLA ABDURRAHMAN VELEDÎ HEMZE

#### 1.1. JIYANA WÎ

Seyîd Molla Abdurrahman Veledî Hemze navê wi yê mahlasî ye. Nave wî yê rastîn Abdurrahman Ekmen e. 1954an de li gundê Xirbekurê (Palamut) ku bi Haskêfa (Hasankeyf) Êlih (Batman) ve giridayî ye hatiye dinê. Bapîrê wî an jî kale wî Sayîd Bîlara li gundê Bêcirmanê ku girêdayê Gercosê (Gercüş) ye jiya ye û ji ber vî yekî ji wan re dibêjin xelkê Becirmanê. Bavê wî Mela Hemze yê kurê Seyît Ibrahîm e û nesla wan digêhêje Imam Huseyn (rXl). Bavê wi sedema ku mela ye li zev gundan gerîya ye. Seyda di gotareki de der heqê dayika xwe waha digot: “ Dayîkamin a rehmêtlî di karu barê xwe de pir têkuz bû, xwedî kirin û kedî kirina lawyê xwe de ji rêzkariyê de kemasi ket qebul nedikir. Bê guman zev li ser edep û terbiya me disekinî. Hemî lawê xwe li ser perwerdeyîya ola Islamê mezin kiriye .” 1960an de bavê wî li gundekî Gercosê dest bi melatîyê dike. Mela Abdurrehman xwendina xwe ya sereke di heft saliya xwe de dest pêdike û li cem bavê xwe dixwune. Bavê wî qurra û mucewit bû perwerdeyiyekî bingehî dide kurê xwe. Di nav demekî kin de Qurana pîraz hifiz dike. Li nik bavê xwe heya yanzdeh û donzdeh saliya xwe perwerdeyîya xwe didomîn e. Bavê wî mela Hemza gelek feqîyê wî hebû ne. Car caran hêjmara feqîyan digihêje heftê û heştê feqîyan. Seyîd Abdurrahman alîkare bave xwe dike û dersa zarokên gundîyan dide. 1964an de bavê wî dîsan mal bar dike vedigere gundê xwe yê Xirbekurê ku giredayê Haskêfê ye. Seyîd Abdurrahman li vir li cem xuşka xweya mezin dimîne û di vî demêde pirtukên ku bi kurmançî hatiye nivîsandin lêkolîn dike, “Nûbihar” û “Ne’culenam” ji ber dike. Donzdeh saliya xwe de bi xwestina dê û bavê xwe dest bi feqîtîyê dike. Pi vî awayî di pêvajoya perwerdeyîya xwe de ji mal dur dikeve. Di perwerdeyîya medresê de cara peşin hevalê bavê xwe yê xwendinê li cem Mela Suleymanê Şêwetê dest pêdike. Gundê Mela Suleymanê Şêfetê li seri çîyayekî bilind e û girêdayê Heskêfê ye. Mela Suleyman zede salih û muttaqî bû. Ittîqad û samîmîyeta wî bandorekî mezin li ser Seyîd Abdurrahman hiştiye. Mela Suleymen gelek mu’emmer bu, gava ku çu ber dilovanîya Xwuda ‘emrê wî set u şanzdeh salî bû. Seyîd Abdurrahman li ba wî çar salan bi şev - roj û havîn - zivistan bê navber dixwune. Di zêrfê çar salî de benc ders tek li çûye sebaba vî ya jî Seyîd Abdurrahman e ne ji seydaye wî ye. Seydayê wî ji gund qet dervediket û zev li ser dersa

feqîyan disekînî. Piştî perwerdayîya çar salan bi îzna seyda xwe radibe diçe gundê Bêcirmanê ba Hafîz Seyîd Huseyn dewama perwerdeyîya xwe dike. Seyîd Huseyn hafîzê ji herdu çavan e yanî her du çavên wî nedidît lê belê Qur-ana Kerîm, tevahî pirtukên dersan, pirtuka Mînhacı Nevevîye û sê hezar hedîs bi qireeta vî hifîz kirîye. Piştî qederekî şunde dîsa vedegere cem seydayê xwe yê berê. Bi çûya ba kîjan mela û seydayan dîsa vedigerîya cem Mela Suleymanê Şêfetê. Seydayê şêx Fexredînê Batmanê ji re xeber dişeyîne dibije bera were cem min ezê îcaza wî bidimê. Seyîd Abdurrahman tê Batmanê ku here cem Şêx Fexredînê Batmanê lakîn mixabîn ew roj xebra mirina wî tê. Dîsan dikeve rê û dizivire cem seydayê xwe. Li cem seyda Mela Suleymanê Şêfetê perwerdeyîya xwe didomîne. Qederek şunda seydayê wî ‘îcazeta wî dide û wî dişeyîne ba bavê wî. Seyîd Abdurrahman ‘îcazeta xwe ya duduyan li cem Mela Muhammed Şefîq hildigire. Di hevde salîya xwe de her çiqas hemla wî li ser medresan û xwendine be jî bavê wî awi dizewicine. Di nozdeh salîya xwe de li gundan dest bi melatîyê dike. Melatîya xwe ya peşîn li gundekî Kozlixê destpê dike. Molla Abdurrahman aşîqê ‘îlîm, pirtuk û xwendine bû. Xwedayê Te’ala li ser ‘îlîm, xwendin û nivîsandinê sebirekî mezin dayê tê. Hal û debara bavê wî û malan wan ket baş nebû, feqîr bûn, nikaribû pirtuk bistenda li belê ev mijar ji bo wî nemesele bû. Ji cîranê gund ji cem Mela Abdullah bi deyndarî pirtuk hildigirt. Pirtukxaneyê Mela Abdullah pir dewlement bû. Pirtukên ku ji cem wî tihanî dixwend û hinek beş û mijaran ji ber dikir, hinek beşan jî di deftera xwe de dinîvisand. Bi vî şêklê û awayî nêzê çar defteran not hilgirtiye. Berhema Cezaîrî ya bi navê “Mezahîbul Erbaa” li ser vî pirtukî nêzê salekî disekine, lêkolîn dike û tehlîl dike. Di vî xebatî de nexweş dikeve û çavên wî xera dibe. Benc cildê vî behremî ji ber dike, hifîz dike û der heqê ‘îlîm û mefhuma mezheban de digehije astekî bilind. Ji muctehîd, mutefekkir, âliman re û zanyariye de hurmet û sîyaneta wî zêde dibe. Lê tu car ev sîyanet nevegare teesup û teqklîdê.

Li gelek gundan û deweran de muezînî, melatî û mamaostetya xwendina Qur-ana Kerîm peyvîrdarî kirîye. Li Batman û Diyarbekîr gelek xwendewanê wî çêbûne. Peyvirdarêya wî sî û benç sal didome û pişt re teqawut bû ye. Di heremê de yekî aqilmend û şewêrmend tê nasîn. Benç lawê wî yên kur û benc jî keçik Seyîd Molla Abdurrahman Veledî Hemze hene. Niha li navenda Batmanê jiyana xwe didomîn e.

## 1.2. BERHEMÊN SEYÎD MOLLA ABDURRAHMAN VELEDÎ HEMZE

Seyîd Molla Abdurrahman Veledî Hemze der heqê nivîskarî û helbestvaniya xwe de vaha dibêje : “ Xwedayê ‘Ezze we Celle hezkirina qelemê û sebra ‘ilmê daye min. Ji bo vî yekî ez her wext dixwezim di nava pirtukan de bim. Me di goteriki de jê pirsibû: Te çima bi sê zimanî nivîsiye sedema vî çî ye? Ew ji vaha persîv da: “Sedema nivîsandina min a ‘Erebî eve ku zimanê Qurana pîroz e û zimanê Resûlê Xwuda ye, sedema nivîsandina min a Tirkî jî eve ku zimanê Dewleta Osmaniyan e, sedema nivîsandinamin a Kurmanci jî eve ku zimanê dayîka min e û zimanê Gaban El –Kurdî ye.” Bi vi awayî nivîskar, helbestvan û ‘alimekî qedir giran bi sê zimanî gelek pirtuk nivîsiye. Nivîskar bi awayê ku bi me re parve kiriye donzdeh berhemên ‘Erebî, çar berhemên Kurdî û heft berhên bi Tirkî nivîsandiye. Nêzê çar hezar rubelan pêk tê û hê jî nivîsandina wî berdewame. Niha li jêr em li ser wan berhemên wî rawestin:

### 1.2.1. Berhemên ‘Erebî

**1- en-Nematü’l-Evsat fi’l ictihâd-i ve’t-Taklid:** Nivîskar di rêbaza fiqhê de li ser mijarên herî girîng a pirsgirêka îctihadê de radiweste. Ser navê pirtûkê de destnîşan dike, ku nivîskar piştgirî daye wek riya navîn temsîl dike, ji têngiştina îfrat û tefrît ve dûr e. Di xebatê de gelek vegotinên ji alimên hemdemê hatiye hilgirtin. Nêrînên van zanyaran li ser îctihadê bi berfirehî hatiye rave kirin. Ev berhem nehatiye weşandin, ji hêla nivîskar ve tê parastin. Nêzîkî ji 400 rûpelan pêk tê.

**2- es-Sîretü’l-Muhammediye:** Di vê xebata xwe de, ku jiyana Pêxember ji çavkaniyên herî ewle berhev kiriye, nivîskar jiyana wî bi kurtasî nivîsandiye. Ev xebata ku pirtûkek dersê ye, di dersên xwe yê siyerê de ji hêla nivîskar ve wekî bîbliyografi Pêxember hatiye bikar anîn. Wekî din, pirtûk li karmendên olî li navçeya ku nivîskar lê dixebite hate belav kirin da ku di dersên siyer de bibe çavkaniyek. Ev pirtûka 250 rûpelî, ku ji rûpelên nameyan pêk tê, hêj nehatiye çap kirin.

**3- el-Îcâzetü’l Uzmâ’d-Diniyye ve Ulûmuha’l-Lâzime li’l-Mucîz-i ve’l Mucâz:** Di dîrokê de tê dîtin ku sertîfikaya ‘îcaza ku ji kesên di Zanistên Islamî de gihîştine qabiliyetek ve hatî dayîn lêbelê îro ji kesên ne jêhatî re tê dayîn. Nivîskar ji vî rewşê nerazî ye. Wî di derheqê zanistên ku îro xwendekarek zanistê de bixwîne ji bo wan agahî dide. Zanistên serdema klasîk û zanistên din ên ku îro hewcedariye ku bi hev re werin fêr kirin û hîn kirin. Nêzîkî ji 250 rûpelan pêk tê. Ne hatî çap kirin.

**4- Îadet-ü'z-Zuhur ba'de'l-Cumuâ:** Li ser nemeja zuhru axhir, ku yek ji mijarên nîqasha yê rojevê ye hatiye nivîsandin. Nivîskar ku tê fêhm kirin di vê xebatî de kareki giran û hewildanek dijwar daye e û di vî mijarê de cîh da ye fikrên hiqûqnasên ku xwediyê dîtinên cûdan e. Piştî ramanên cûda, ew li ser bingeha tercîha xwe radiweste. Nêzikî ji 250 rûpelan pêk tê. Ne hatîye çap kirin.

**5- Tefsiru Süreti'l-Fatiha:** Wî şiroveyek anjî tevsîrek berfirehî li ser Sûreya Fatihayê sekinî ye. Wî gelek şiroveyên û vegotinên ji hêla 'alimên din ve hatiye dîyarkirin hilgirtîye û cîh daye fikr û ramanên wan. Ew berhem teqrîben ji 600 rûpelan pêk tê. Ne hatî çap kirin.

**6- el-Ezkâru'l-Me'surat ve Dua'ul-Merviyyât fi's-Salâti ve Hârici's-Salâti:** Ev berhem derhqê nimêjê da ye. Ew dua û zikrên ku li hundur û derveyî nimêjê de werin xwendin ji bo vi berhemek berhevkiyîye. Niha ji çapê re amadeye. Nêzikî ji 260 rûpelan pêk tê.

**7- Hamsu Mieti Hadisin Sîhahin ev Hîsânin fi'l-Ahlaki ve'l-Âdâb:** Ev berhem derhqê exlaqa Hz. Pêxemer de ye. Wî cîh da ye 500 hedîsê Hz. Pêxemer ku têkildarî exlaq û adabê ye. Ji van hedîsên ku mînak daye yê sehîh û rastin. Di vî xebatî de gelek bi baldarî xebitîye. Ew berhem teqrîben ji set rûpelan pêk tê. Ne hatî çap kirin.

**8- Durusun De'viyye:** Nivîskar li ser rêgezên daweta Islamê sekinîye. Der heqê vî mijarî de nivîsê xwê yê berê berhevkiyîye. Ew gelek gotinên û fikrên rêberên Islamî ya îroyîn hilgirtîye û wek çavkanî nîşandaye. Ne hatîye çap kirin.

**9- Buhusun İlmiyye Tubîdu Efkâran Cahiliyye:** Hin îdeolojî hene ku îro pir belav bûne û pir xurtin ku ev pirtuk der heqê wan îdeolojîyan de ye. Der heqê van nîqaşên îdeolojîk de nêrinên 'alim û mucahîdên Islamê yê vî serdemî çiyê hatiye lêkolîn û berhevkin. Bi taybetî van îdolojîyên ku bi ola Islamê re nayê li hev kirin rexne dike û hewl dide ku fikrê wan werin pûç kirin. Ev xebata ku bêtir dişibihe berhevokek. Ji bo çapê amade ye. Nêzikî ji 800 rûpelan pêk tê.

**10- Fedâilu'l-Kur'an-i bi'l-Kur'an ve bi-Ehâdîsi's-Sîhâhi ve'l-Hîsân:** Der heqê hinek ayetên Qurana Pîroz û hinek hedîsên Resûlê Xwuda de radiweste. Ayetên derheqê fezîleta Qurânê û hedîsên pêbawerîn an jî yê hedîsên sehîh mînak daye. Di vî xebatê de behsa sed û sîh hedîsên rastîn tê kirin. Ew ji 120 rûpelan pêk tê. Ew nehatiye çap kirin.

**11- Behsun ân Furûdul Vakti:** Ew rîsaleyek piçûk e ku li ser girîngiya nîrxandina rast a bikaranina demê hatiye nivîsandin. Wexten yen vala gelo çawa bite ‘emilandin? Mîrov ku neçar nemine her yek berpirsiyariyên dema xwe ye. Ew pirtûkek bi qasî 60 rûpelî pêk tê û nehatiye çap kirin.

**12- Tis’atûn ve Tis’ine Hadisen Nebeviyye fî Amel-i ve’l-Leyle:** Bi behsa not û nehêdîsên rastîn dike. Di nava tevgerên rojê de rûtîn ên ku divê mirov bike hatiye vegotin. Ev karekî şewirîyê ye. Ne hatî çap kirin.

### **1.2.2. Berhemên Kurdî**

**1- Mewlûda Faxrê ‘Alamê:** Ev xebata ku wî bi Kurdî bi alfabeya ‘Erebî nivîsandîye û mînakek mewlûdê ye. Di sala 2013’an de ji hêla pirtûkxaneyê Seyda ve li Dîyarbekirê hatî weşandin. Heya niha tenê vî berhema wî ya hanê hatiye çapkirin

**2- Siretû’n-Nebeviyyetû’l Munazzama bi’l-Lisâni-Kurdî:** Ew qala exlaq û sunneta Hz. Pêxember dike. Ji 1000 (hezâr) cotbendan pêk tê. Ew di pirtûkxaneyê nivîskar de hatiye parastin û nehatiye çap kirin.

**3- Akidetûn Selefîyetûn min Akidet’i Selef’is-Sâlihi:** Li ser bingehêya baweriya Islamê radiweste. Ew di vî karekî de li ser dîtinên zanyarên anjî ‘alimên selefîyan sekinîye. Bi awayekî menzumî hatiye nivîsandin. Ew nêzîkî ji 1000 (hezâr) cotbendan pêk tê. Ne hatî çap kirin.

**4- Divanâ el-Lu’lu ve’l-Mercan:** Ew sedema derketina ji rêya Islamê û alozî û bextreşiyên bi serê misilmanan de hatine vedibêje. Ew dîwana ku nivîskar helbestên ku gelek salan nivîsandîye li vir de berhev kiriye. Tê de exlaq, edeb û vexwendîniya Islamê heye. Ew pirtûkek bi qasî 1800 cotbendan pêk tê û nehatiye çap kirin.

### **1.2.3. Berhemên Tirkî**

**1- et-Tasavvufu ‘inde’s-Selefi ve’l-Halef:** Nivîskar li ser tasavufê nerinê xwe yê rastî xwuyadike. Bi vegotina gelek zanyaran di derheqê zanista sofîzmê û tasavufê de agahdariya gelemperî tê dayîn. Ew ji 100 rûpelan pêk tê. Hêj nehatiye weşandin.

**2- Hukuku’z-Zevceyn:** Li gorî şerî’eta Islamê, ji bo ragihandina maf û berpirsiyariyên jin û mêr li ser hevûdu hatiye nivîsandin. Ew ji 100 rûpelan pêk tê. Ne hatîye çap kirin.

**3- el-Cema'atü'l-İslamiyye Şurûtuḥâ ve Mahiyyetuḥâ:** Li ser civakek anjî cema'etek Islamî divê çawa be hatiye nivîsandin. Di vî dema dawîn de ji 'alimên Islamî çavkanî hilgirtîye û vegotinê wan nivîsandiye. Li ser pirsê ku avahiya civakek Islamî divê çi be, ji bo vî li bersivêk geriyaye. Nêzikî ji 300 rûpelan pêk tê. Ne hatîye çap kirin.

**4- Hutbetü'l Minberu's-Seneviyye:** Ew ji xutbeyên bedew ên ku li ser minber roja îne tene xwendin pêk tê. Ew ji 150 rûpelan pêk tê. Ne hatîye çap kirin.

**5- Durusun fi'd-Da'va:** Ew ji berhevokek nivîsarên nivîskar ên li ser xweza û xwezaya ola Islamê pêk tê. Ew ji 150 rûpelan pêk tê. Ne hatîye çap kirin.

**6- İslamın Mübarekarek Nesline Nasihatler:** Ew xebat ku tê de hin şîretên ku ji hêla nivîskar ve ji bo endamên malbata wî hatine kirin hene. Nêzikî ji 300 rûpelan pêk tê. Ne hatîye çap kirin.

**7- Covid-19 Risalesi:** Wî sedem û encamên vê epîdemiye ku ji ber nexweşiya Covid-19 derketiye holê û awayên pêşîlêgirtina vê nexweşiyê şîrove kiriye. Wî her weha sedemên manevî yê li pişt vê nexweşiyê şîrova dike. Wî nû vê xebatê xilas kiriye û ji 750 rûpelan pêk tê. Li benda çapê sekinandîye.

Bê navber û bê rawestandî gelek berhem nivîsîye û ev pirs di mejuyê mirov de zindî dibe: Gelo ewqas berhem çima nehatîye çapkirin? Me jî evî pirsî ji seyda pirsî û bersîva me waha da:

**1-** Debara mala Seyîd Molla Abdurrahman Veledî Hemze li ser maaşê wî yê melatî ye. Bi debara melatîyê beç kur û beç keçik bi temami deh zarok xwedî kirîye, wan mezin kirîye û xeynî keçika wî ya astengdar tevahîyan bi maaşê melatîyê zewicandî ye. Niha ew, xanima xwe û tevê keçika xwe ya astengdar li ba hev dijîn. Di nava wan şert û mercên dinyayê de hem debara malê hem jî çap kirina pirtukan ji aliyê aborî ve nemumkun e.

**2-** Ew îfade dike ku ji ber ku ew ne girêdayî tu civat û terîqetan e, wî ji bereketên civatan sûtûd wernegirt û dem bi dem di bin ambargoyê de bû. Ev mewlûd, ku tenê xebata wî ya çapkirî ye, dibêje ku ji ber ku ew mewlûda Bateyî rexne dike pir hindik hatiye firotan.

**3-** Ji ber ku di malbat û hevalên wî yê nêz de merivên dewlemend tunebûn, kes tunebû ku fedakariyê bike û berhemên wî çap bike.

4- Ji ber ku ew pir bi rûmet û şanazî xwe hez dikir û li ber xwe diket wî ji kesî nedixwest ku pirtûkên xwe çap bike.

Ji ber van sedeman, ew nivîsên xwe li bendê dihêle, wan dinirxîne, tehqîq dike û ji weşanê re nalezîn e.

## BEŞA DUYEM

### MEWLÛDÊN KU BI KURDÎ HATIYE NIVÎSANDIN Û DI NAVA MEWLÛDÊN KURDÎ DE CÎ YÊ MEWLÛDA FAXRÊ ‘ALEMÊ ÇI YE

#### 2.1. MEWLÛDÊN KU BI KURDÎ HATIYE NIVÎSANDIN

Ji ber ku kevneşopiya nivîsandina mewlûd ji demên kevnare ve dest pê kiriye, gelek mewlûd ji hêla helbestvan, mela û şêxan ve hatine nivîsandin. Di encama lêkolîna ku heya niha hatî kirin de, ji 60î zêdetir nusxeyên mewlidê ku bi Kurdî nivîsandî hatine nas kirin. Çend hêjmara rastîn a wan mewlûdên ku bi Kurdî hatine nivîsandin nayê zanîn. Yen ku hatine tespît kirin bi gelemperi viha ye: 34 kurrani, 8 zazakî û 18 mewlûd bi zaravayên Soranî hatine nivîsandin (Ertkin,2017:152). Ev hêjmar ji hela lêkolînan ve roj bi roj zêde dibe. M. Zahir Ertekin û Nurettin Ertekin (2017: 151-154), ew mewlûdên ku bi Kurdî hatine nivîsandin bi kronolojîkî lê jêr di taployê de wiha rêz dikin:

Rêz	Nivîskar	Navên Mewlûdê	Diyalekt
1	Mela Huseynê Bateyî	Mewlûda Bateyî	Kurmancî
2	Şêx Huseyin Qazî	Mewlûda Şêx Huseyin Qazî	Soranî-Hewramî
3	MelaEhmedê Xasî	Mewlidê Nebîyê Qûreyşî	Zazakî
4	Osman Efendiyo Babij	Biyîşê Pexemberî	Zazakî
5	Seyyid Muhemmed Behaeddîn Şems Qureyşî	Mewlûda Seyyid Muhemmed Şemsî Qureyşî	Soranî-Hewramî
6	Şêx Mûhemmed Xal	Mewlûdname ê New Eser Ya Tarîxê Pêxember	Soranî- Hewramî
7	Pîremêrd	Mewlûda Pîremêrd	Soranî-Hewramî
8	Mehemed Emîn Beledî Şinewî	Mewlûd	Soranî-Hewramî
9	Mamosta Mehemed Qadî Xidrî Eşnewîye	Mewlûd	Soranî-Hewramî

10	Mamosta mela ‘Ebdulkerîm Muderrîs	Mewlûd	Soranî
11	Mela Mehemed Elî Hûnîj	Mewlûda Peyxemberî	Zazakî
12	Mamosta Huseyîn Şeyxanî Eşnewîye	Mewlûd	Soranî-Hewramî
13	Mele Mûhemmed Şerîf Kurê Mele Şêxmûsê Batirgêzî	Rîsalet ul –usûl Fî Mewlîdî-ir Resûl	Kurmancî
14	Mela Zahidê Hadiyê Endarî	Herdûbat	Kurmancî
15	Mela Hesên Kurê ‘Elî Fîrfêlî	Mewlûda Nebî	Kurmancî
16	Seyîd Feyzullahê Findikî	Gula Narincî Mewlûda Kurmancî	Kurmancî
17	Mele’Eliyê Baqustanî	Mewlida Nebî	Kurmancî
18	Mela Ehmed Nas (Zinarexî)	Fêkiyê Narencî Mewlûda Kurmancî	Kurmancî
19	Seyîd Feyzullahê Findikî	Mewlîda Şerîf Hate Safa Di Mewlida Mustafa	Kurmancî
20	Melle Burhan el-Hedbî	Mewlûda Kurdî Bi Şêwaza Hedbî	Kurmancî
21	Mela Kamilê Puexî	Mewlîdî Nebî	Zazakî
22	Mela Mehemedê Muradan	Mewlîdî Zazakî	Zazakî
23	Bîlal-Feqî Çolige	Mewlidê Peyximbêr Qey Tutanê Zazon	Zazakî
24	Şêx Mêhdî	Mewlûda Kurmancî Kurtahiya Mewlûda Bateyî	Kurmancî
25	M.Mustafa yê Mela ‘Aliyê Ezdarî (Mustafa Turan)	Mewlîda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rêberê Xelasê	Kurmancî
26	Mûhemmed Helîm Xursî	Pesindana Mûhemmed	Kurmancî

27	Mela Ehmed Kurê Mela Osman Hêştrekî	Mewlûda Nebî	Kurmancî
28	Mela Muhammed kurê Mela Ehmedê Xursî	Nezma Şêrîn Der Mewlîd û Sîreta Resûlê Emîn	Kurmancî
29	Mamosta Mela 'Umer Nûrbextî Neqde	Mewlûd	Soranî-Hewramî
30	Abdulqadir Mûşekî	Mewlîdî Nebî	Zazakî
31	Mehmet Akif Demir	Mewlûda Zazakî	Zazakî
32	Mamosta Celî Zade	Mewlûd	Soranî-Hewramî
33	Mamosta Mela Hadî Efxemzade	Mewlûda Mûfessel	Soranî-Hewramî
34	Mamosta Mela Hadî Efxemzade	Mewlûda Muxteser	Soranî-Hewramî
35	Mamosta Mela Muhemedê Şelmaşî	Mewlûdname ê Kûkerdnewe	Soranî-Hewramî
36	Kak Ehmed Muftîzade	Mewlûd	Soranî-Hewramî
37	Seyyid 'Ebdullahê Weblberî	Mewlûdnamew Pêxemberî	Goranî
38	Şêx Nesîm Texteyî	Mewlûdnamew Pêxemberî	Soranî-Hewramî
39	Mamosta Rehman Huseyinzade	Mewlûd	Soranî-Hewramî
40	Şêx Muhammed Emînê Heyderî	Mewlîdî Nebî	Kurmancî
41	Şêx Feyzullah Xiznewî	Mewlûda Pêxember	Kurmancî
42	Mela Muhammed Siraceddînê kurê Ebdilhekîmê Xelîfî	Kitêba Dura Birincî Mewlûda Kurmancî	Kurmancî
43	Seyyid Bedreddîn Ibn Mela Salih El- Hesenê Şafi'î El- Kefsûrî	Mewlûda Kurdî Bi Zimanê Gundî	Kurmancî

44	Mela Silêman Kurşun	Mewlûda Pêxember	Kurmancî
45	Seyîd Mela Ebdurrehman Kurê Mela Hemze	Mewlûda Fexrê 'Alemê, Muhammed	Kurmancî
46	Mela Elî bin es-Seyid 'Evdurrehman Omerî	Ava Heyatê	Kurmancî
47	Mela Mûsa Celalî	Mewlûda Celalî	Kurmancî
48	Mela 'Ebdurrehman Bêcirmanî	Mewlûda Mûhemmed Mustefa	Kurmancî
49	Mela 'Ebdurrehman Xerxorî	Mewlûda Sîyer	Kurmancî
50	Seydayê Tîrêj	Mewlûda Pêxember	Kurmancî
51	Mele Nûriyê Hesarî	Mewlûda Pêxember	Kurmancî
52	Mele Zahid Pasûr	Sîyera Pêxember	Kurmancî
53	Mela Şewqî Helex	Mewlûda Nebî	Kurmancî
54	Mela Şewqî Xak	Mewlûda Nebî	Kurmancî
55	Mela Muhammed 'Elî Fudeylî	Mewlûda Şerif	Kurmancî
56	Mela Mûhemmed bîn Mela 'Ebdulxefûrê Hezanî	Mewlûda Nebî	Kurmancî
57	Mela Yasîn Yusrî	El- Mewlûdun'nebiyyî	Kurmancî
58	Mela Xelil Mişextî	Mewlûda Resûl	Kurmancî
59	Adar Jiyan	Mewlûd	Kurmancî
60	Reşad Mehemed Miftî	Mewlûdnamey Kurdî	Soranî

(Z. Ertekin û N. Ertekin, 2017: 151)

Di nav gel de hin nivîskarên mewlûdên ku di raya giştî de tene zanîn pir navdar in, hin ji wan nayên zanîn û heta niha berhemên wan nehatine weşandin. Piranî helbestvanên mewlûdan, mijarên ku Bateyî vegotinên ku wî û rêzkirina wî, babetên wî di mewlûdên

xwe de bi kar anîne. Dema ku van mewlûd têne lêkolîn kirin, bandora Bateyî bi zelalî tê dîtîn (Kızıllı, 2012:120). Ji ber ku derfeta me tune ku em hemî mewlûdên ku bi Kurdî hatine nivîsandin vekolînin, em ê li vir hin ji wan ên herî bijarte û naskirî rawestînin. Berhema ku heya îro herî pir hatî xwendin û navdar e, mewlûda Mela Huseynê Bateyî ye.

### **2.1.1. Mela Huseynê Bateyî: Mewlûda Nebî**

Mewlûda Nebî, ku ji hêla Mela Huseynê Bateyî ve bi Kurdî hatî nivîsandin, yekemîn mewlûda Kurdî ye. Kesê ku mewlûdên bi Kurdî hatine nivîsandin lêkolîn bike, divê bi Mewlûda Nebî ya Mela Huseynê Bateyî dest pê bike. Li ser tarîx û serdema jidayikbûna vî kesê ku bi navê Mela Huseynê Bateyî çêtir tê zanîn, du gotinên cûda hene. Hin ji Kurdologan: Sadiq Bahaddîn, Qanatê Kurdo, Muhammed Emîn Zekî Beg, Bazil Nikîtîn, Minorsky, Aleaddîn Seccadî ve Ayhan Geverî fikra wan eve ku Mela Huseynê Bateyî di sedsala 15an de jiyaye. Komêk din a Kurdologan jî: Maruf Haznedar, Feqî Huseyn Saxinç, Amir Hassanpour û Ebdurrqip Yusuf Ew dibêjin ku ew di sedsala 17an de hatiye dinyayê û di sedsala 18an de miriye û çûye ber dilovaniya Xweda (Îlhan, 2016: 21). Li gorî lêkolînerên navdar M. Xalit Sadînî, ew di salên 1670-1750'an de û di dema Ahmedê Xanê de jiyaye (Sadîni, 2015: 91). Li gori nêrinên me fikra ya rast a M. Xalit Sadînî ye.

Lêbelê, ev rastiyek e ku ev mewlûdê, ku ji cara yekem a ku pê ve hatiye nivîsandin û gelek bala gel kişandiye û li her derê hatiye xwendin, ew qas navdar bûye ku pirraniya mirovan nivîskar an navê mewlûdê nizanin li ev hevokan ji ber kirine:

*“Hemdê bê hed bo Xwedayê ‘alemîn*

*Ew Xwedayê daye me dîne mubîn”*

Her çend piştî Bateyî heya îro mewlûdên cuda hatine nivîsandin, lê yek ji wan bi qasî mewlûdê Bateyî nayê zanîn. Divê ew ji ber ku ew mewlûdê yekem bû, ji ber ku mewlûda Melayê Bateyî çavkaniya hema hema hemî mewlûdên Kurdî bû ku piştî wî li herêma hatine nivîsandin. Di mewlûdên ku li ser mewlûda Melayê Bateyî hatine nivîsandin de, heman babet ji hêla nivîskarên din ve jî hatine xebitandin (Kızıllı, 2012: 12). Ji vî aliyê ve mimkun e ku meriv li ser mewlûdên Kurdî qala celebê "dibistana Bateyî" bike (Ertekin, 2015: 190). Tehsîn Îbrahîm Doskî mewlûda ‘Erebî ya Ibn-î Hacer el-Heytemî wekî çavkaniya herî girîng a mewlûdê ku ji hêla Bateyî ve hatî nivîsandin nîşan dide. Li gorî Doskî, heya ku Bateyî ev mewlûda Kurdî ne nivîsandiye, Kurdan bi saya

wergerandinên Kurdî yê melayan ji mewlûda ‘Erebî ya Ibn-î Hacer el-Heytemî sûûd werdigirtin. Sedema sereke ya vî yekê eve Ibn-î Hacer el-Heytemî û gelê Kurd îtîqada sunniyan û mezheba şafi’îyan de hevpar û alîgirin hevin (Doskî, 2015: 140-141). Bateyî mewlûdê xwe bi zimanekî giran nivîsandiyê. Ji ber ku ew pir bi zanistên Erebî û Farisî re mijûl bûye. Usan xuya dike û tete gotin ku ev nivîs ji mewlûdên kurdî yê din edebîtir e. Ev mewlûd, ku ji hêla karbidestên olî û raya giştî ve ji ber taybetmendiya aheng û rîtma ayetan bêtir tê xwendin, di sala 1905an de li Qahîreyê û di sala 1908an de jî li Stenbolê hate weşandin (Agitoğlu, 2014: 121 ).

Mewlûda Nebî ya Bateyî bi zaravayê Kurmancî ya Kurdî hatî nivîsandin û bêtir xwedî û taybetmendiyan bilêvkinê Hekarî ye ( Öztürk, 2018: 84). Divê ev ji ku pênc sedsalên zêdeye ku derbas bûne, diyar e ku guherînên di zimên de famkirina xebatên kevnar diwar dike. Forma qafiyeya mewlûdê; aa, bb, cc, dd, ... bi vî awayî ye. Mewlûda Nebî, celebek mesnevî ye ku bi kêşeya aruza wî bi remela fâ’ilâtun fâ’ilâtun fâ’ilun hatiye nivîsandin. Li gorî nivîsa rexneyî ya ku ji hêla Ziver Ihan ve hatî weşandin (2016: 34) ew ji 563 cotbendan pêk tê. Her beş bê sernavan dabeşkirî ye. Ev hevoka jêrîn di dawiya beşan de hatiye dubarekirin da ku veqetîna beşan nîşan bike:

*“Ger dêvîtin hûn ji narê bin necat*

*Bi’aşk û şewqek hûn bibêjin es-selât.”*

Piştî vê cotbendê dia şandin û selatê li ser Hz. Pêxember bi hev re tê gotin. Bi rastî, dema ku ev selewat tene anîn, di hin civakan de ew radibin û bi rêzgirtinê destên xwe pêş digirin tene xwendin. Mewlûda Bateyî cara yekem li Qahîreyê hevalê Said-i Nûrsî ji aliyê Ahmed Ramiz ve hatiye sipandin û paşê ew ji hêla Şêx Muhammed Şefîk el-Arvasî ve li Çapxaneyê Ahmed Kamil li Stenbolê hate çap kirin. Ev mewlûd di Pirtûkxaneyê Elî Emîrî de bi jimara 1369an de ye. Sala 1996an de çapek pejirandî jî ji hêla Tahsin İbrahim Doskî ve li Duhokê Iraqê hatiye weşandin (Yüksel, 2015: 130).

### **2.1.2. Şêx Muhammed Emîn el-Heyderî: Mewlûda Nebî**

Îro di merasîmên mewlûdê de mewlûdê ya herî bijare ya Kurdî, digel Mewlûda Nebî ya Mela Huseynê Bateyî, li Mêrdîn û derdora wê Mewlûda Nebî ya Şêx Muhammed Emîn el-Heyderî ye. Heyderî mewlûdê xwe bi hinceta ku Mewlûda Nebî ya Bateyî ji hêla gel ve bi tere xwe nayê fem kirin nivîsandiyê. Hayderî di 1927 de li Nisêbîna ku giridayê Mêrdînê ye hatiye dinê. Di dema şerê cîhana yê yekem de, dema ku Rûsan herêm dagir

kir, ew ji Nisêbîna Mêrdînê koç dike di çê aliyê Agirî-Patnos ê ve. Dawiya şerê cîhana yekem ew disa vedigere Nisêbînê û şaxek ji eşîra Hayderî ye ku li Nisêbînê bicîh bûye. Wî “Heyderî” navê eşîra xwe wekî paşnav bikar anî ye. Bavê wî, Mela Ahmet al-Hayderî, ku mîna wî ‘âlim bû, perwerdayiya seretayî û xwendin û bîrdariya xwe li cem bavê xwe diqedîn e. Dû re ew ji bo perwerdehiya xwe çû gelek ba melan û deran. Wî di cûrbecûr medrese û mizgeftan de wekî îmam û mudderrîsan kar kirî ye. Berhemîna Hayderî, Eqîda Îmanê, Mewlûda Nebî, Werdu’l-Etfal û Dîwan e. Hayderî çalakiyên xwe yên rêberî û mizgîniya Islamê heya mirina xwe di 2003’an de domandî ye (Tıraşçı, 2013: 215). Her çiqas Hayderî mewlûdek ‘Erebî jî nivîsandinê ku jê re dibêjin Mevlîdu'n-Nebî, ew bi piranî bi mewlûdê Kurdî tê nas kirin. Mewlûda Kurdî di şeva qandîla mewlûdê de ya sala 1975an de hatî nivîsandin. Di şevê de xelas kiriye. Dema ku cara yekem hate nivîsandin ji 314 cotbendan pêk tê. Lêbelê, ku hin vegotinên ne-rastîn û hedisên mevzu di mewlûdê de xwuya dike pişt re ji hêla nivîskar ve hatin rakirin û xebat daket 200 cotbendan (Akçay, 2013: 398).

Naveroka mewlûdê, ku ji neh beşan pêk tê, ev e: Munacat, xwendin û nirxa mewlûdê, afirandina Nura Muhammedî, bi peyrewiya pêxemberan hilgirtina Nura Muhammedî, nesla Hz. Pêxember û ducanîbûna Amîne, bûyerên mu’cîzeyî yên ku di vê demê de qewimîne, Jidayikbûna Hz. Pêxember, beşa merhebayê, û di dawiyê de pesnê Hz. Pêxember (Öztürk, 2018: 84 ).

Mewlûda Hayderî hema hema dişibe mewlûda Mela Bateyî ye. Di vê mewlûdê de navên beşan nehatine nivîsandin. Sê rûpelên dawî de dia kî ‘Erebî heye, li ser 32 rûpelî hatiye çapkirin. Veguheztina di navbera beşan de bi cotbendên jêrîn ên ku selewatê dixwazin pêk tê:

*“Hûn ji ‘îşqa dil bibêjin berdewam*

*Ser Muhammed esselatu we’s-selam”*

Cotbenda yekem a mewlûdê wiha ye:

*“Em bidin hemdê Xwedê ey musulman*

*Daye me pêxemberê axir zeman”* (Kızııl, 2012: 121).

Ev mewlûd ji dayîkbûna Hz. Pêxember ve bi dawî bû ye. Beşa dawî fesla merhebayê de cotbenda pêşîn e:

*“Hat Muhammed merheba sed merheba*

*Hat Muhammed bu şefî'ê muzniba”*

Her çend ew beşa "Merheba" be jî, peyva "Merheba" tenê di hevoka yekem a vê beşê de tê bikar anîn. Mewlûd bi hevokên ku li şûna " Merheba " bi "Hat" dest pê dike û diqede (Kızıl, 2012: 122).

*“Hat Muhammed rahmeten li'l-‘âlemîn*

*Hat Muhammed xatimen li'l-murselîn”*

Di hemî mewlûdan de, beşa diayê jî heye. Mewlûd bi diayê sê rûpelî ya bi Kurdî hatî nivîsandin diqede.

### **2.1.3. Şêx Muhammed Siracuddîn: Durra Birincî Mewlûda Kurmancî**

Mewlûd ji aliyê Şêx Muhammed Siracuddin ve hatî nivîsandin, ji hêla Weşanxaneyê Dua ve di sala 2009'an de bi navê Mevlûd bi Kurdî hate weşandin. Ew sedema nivîsandina mewlûdê di pêşgotina xebatê de vedibêje ( Tıraşçî, 2013: 216). Mewlûda Şêx Muhammed Siracuddin ji mewlûda ku Mela Huseynê Bateyî bi destnivîsa xwe nivîsîbû hate girtin. Wî hin guhertin çêkir da ku ji hin peyv û hevokan tam bêne fam kirin. Tu guherîn çênebûn, ji bilî belkî lêzêdekirina rêzek an du, an guherîna peyvek an du. Ev mewlûd guhertoyek ji xebata Bateyî ye ku bi zimanek hêsantir a Kurdî hatî nivîsandin. Naveroka mewlûdê ku şanzdeh beşên wê hene, ev e: Di destpêka mewlûdê de, pesn û pesnê Xwedayê mezin heye û dûv re li ser yekîtiya wî, bereket, comerdî û ji gunehan pir bexşîner tê gotin. Di beşên din de ducanîbûna Hz. Amîne, hin bûyerên ku berî jidayikbûna Pêxember di qewimîn, jidayikbûn, zarokatî, civantî, teswira pêxember. Piştî hatina Pêxemberê ummetê û beşa li ser girîngiya wê ya ji bo umetê re derbas dibe, û ev serî bi radiwestin tê xwendin. Paşî, bi rûniştandin selewat û diayê dixwîne û bi Fatîha diqede. Beşa şazdehemîn û paşîn beşa diayê ye (Tıraşçî, 2013: 217).

### **2.1.4. Mela Muhammed Xursî: Nazma Şîrîn**

Nivîskarê Nazma Şîrîn Mela Muhammed kurê Mela Ahmed e û ji Mêrdînê ye (Ertekin, 2008: 13). Mela Muhammed Xursî sedema nivîsandina mewlûda xwe di pêşgotina xebatê de vedibêje. Hedîsên derewîn di mewlûdên Kurdî de pirin û a mirov xemgîn dike û ji aliyek din ve ew dibêje ku divê mewlûdek li gorî hedîsên were nivîsandin. Mela Muhammed karê helbestvanîyêde pir jirek e ji ber bandora Mem û Zîn

de ma ye ku mewlûdek peyda bike. Naveroka mewlûda bi navê Nazm-1 Şîrîn, ku tê wateya awaza şîrîn, ev e. Mewlûd ji bîst û sê beşan pêk tê. Nivîskar bi besmele û dûvre li Hz. Pêxember bi selam û selatan dest bi kar dike. Nubuveta Hz. Pêxember, û tê di Tewrat û Incîlê de Hz. Pêxember, serdema nezaniyê, jidayikbuna Hz. Pêxember û kerametên ku wê demê qewimîn, rêza Hz. pêxember, mirina bavê wî û dayîna şîrê dayika wî, Li ser mirina diya Hz. Pêxember, bapîrê wî û ew ji hêla mamê xwe ve li ser mirinê hate girtin, Rêwîtiya Hz. Pêxember di donzdeh saliya xwe de çû Besrayê, Zewaca wî bi Hz. Hatîce re û salên Mekkeyê, hatina wehyê, piştî wehiyê çî qewimî, sala xemgîniyê, kerametan, mesela Mîracê, avakirina Dewleta Islamî li Medîneyê û şerên yekem, peymanê Hudaybiyê, dagirkirina Mekkê, wesfên exlaqî, ferman û serokatîya wî gelek keramet û mirina wî û piştî vana beşa duayê heye (Tıraşçî, 2013: 218).

### 2.1.5. Mela Zahîd: Mewlûda Şerîf Herdû Bâtî

Mewlûda Şerîf Herdû Bâtî ji hêla Mela Zahid ve hatîye nivîsandin, ji Mela Bateyî îlham girtiye. Ji hêla şêwaz, ziman, devok, qafiye û helbestê ve dişibihe mewlûdê wî. Ew mewlûd ji 22 sernavan û 667 dubendî pêk tê. Ev mewlûd di 1973an de li Diyarbekirê hate qedandin û di 1978-an de li Stenbolê ji aliyê Weşanxaneyê Bayraktar ve hate çap kirin. Wî her weha bi mewlûdê ku wê nivîsî, bandor li Seyda Tirej kir, û wê jî mewlûdek nivîsand. Mewlûd, ku pir dirêj û fireh e, di bin bîst û du sernavên jêrîn de hatiye nivîsandin: Hamdele, Qenciya xwendina mewlûdê, rêzgirtina mewlûd û mewlûdê bibe adet, Evîna Hz. Pêxember û ronîkirina ronahiya wî, afirandina erd û ezman, afirandina Hz. Adem û ronahiya Hz. Pêxember, kerametên bavê Hz. Pêxember, dayik, zewaca dê û bavan, ducanîbûna dayikê û bûyerên awarte yên ku di vê demê de qewimîn, mirina bavê wî û xemgîniya diya wî, jidayikbûn û fesla merhebayê, mû'cîzê ku dayika wê şahidî kir, bûyerên awarte yên ku di şeva ku wî ji dayik bû de qewimîn, çûna li cem Helîme, şivantiyê wî, bûyerên razdar ên ku di vê serdemê de qewimîne. Mirina dayikê, piştî mirina dayika xwe ji hêla bapîrê wî Abdulmuttalib û piştî jî ji hêla apê wî Abu Talib ve hatî parastin, zewaca wî bi Hz. Hatîce re û hatina pêxemberiyê, ew bi bûyera hîcretê û di dawiyê de duayê mewlûd a klasîk de diqede (Tıraşçî, 2013: 224). Veguheztin di navbera beşan de bi hevakên jêrîn ên ku selewatê dixwazin re têne çêkirin:

*“Ger dixwazin hûn xilasbin ji agir*

*Selewatan bînin civata hazir”*

Hevoka yekem a mewlûdê wiha ye:

*“Pesnê pir bo Xweda’yê ‘alemê*

*Ew Xwedayê daye me pir keremê”*

Hevoka dawîn wiha ye

*“Paşîya mewludê livir bûye tamam*

